**Têwyalî:**
n. z.>nt.
Dîn, beredayî, bêkêr.
**Mînak:** Têwyalîya/ê têwyalî.

**Tirhok:**
n. z.>m.
Şer, doz, bûyer.
**Mînak:** Xweda qebûl neke, ez çawa ketim tirhokeka aha?

**Torbegotran:**
n. z.>nt.
Kesên ku ji xwe ra nakin, lê ji xelkê ra karûbaran dikin. Pirant ji bo zarokan tê gotin.
**Mînak:** Torbegotrana/ê heram.


**Tûrqul:**
r. z.>nt.
Kesên bêsexbîr, destên xwe li malê xwe nagirin. Wekî ku tûrikê wan qul e, çiqas bixebitin jî xerc dikin.
**Mînak:** Ew sed salan jî bixebite hêç e, ji ber ku tûrqul e, nikare malê xwe berhev bike.


**Xaşbir:**
r. z.>nt.
Gîhayê ku xweş tê çinîn.
**Mînak:** Gîhayê mêrga me ya jêrê, gîyayekî xaşbir e.

**Xecîlbûn:**
l. z.>m.
Bêdengbûna ji ber hereketên şermî.
**Mînak:** Dema bavê min cixare di devê min da dît, hema ez ji xwe ra xecîl bûm, sekinîm.

**Berhevkar:** Firat Keklîk
**Zarbêj:** Sînem Keklîk
**Temen:** 78
**Herêm:** Agirî

Serkant


Orhan Tanhan



# Peyvên rezvanîyê li Devera Kercewsê

**Wextê hinek dihatin cem me û behsa bîranînên xwe dikirin gelek tiştên ku heta hingî min nebihîstibûn digotin, nexasim yên ku dihatin hemsalê dêya min bûna.**

**Hejar Dilbirîn[*]**

## Meseloka kêrûşkê



Xîya diçin nêçirê kêrûşkê digrin. Kêrûşkê digrin tînin kadînê. Kadîn jî bê derî ye, nîr didin berê. Nîr didin berê, serê şeveqê tên kêrûşk filitye çîye.[5] Gazî jîrkê xu dikin, divên:

"Kêrûşik di ku ra çîye?"

Li vî alî der e, li wî alî der e, de derê kadînê vekirye, dar li berê he.

"A divê xudê qulka şûna kulavera çîye."

Qulka şûna kulaver jî ev qasahe biçûk e.

2

## Meseloka torbê ar

3 Rojkî jî, wê çaxê, kut hevûne kut. Sitûn hevûne binê goma da. Torbê ar danîne ber sitûnê. Danîne ber kutê, bûk jî teze anîne. Deweta wê kirine, çîye ku ar derxe. Diçe teveqê dive torbe dixe deskî xu vî alî kutê ra dive, yekî jî vî alî kutê ra, dive davê teveqê. Dike nake nizane destê xu ji teveqê berde o awsa berê dimîne. Gazî dikin jîrkê xu, divên:

"Em çawa bikin? Em kutê bibirin, em çawa bikin?"

Divê:

"Wele na, kutê mebirin, ew ê xanî heloşe. Em ê milê wê jê kin!"

Ku divê em ê milê wê jê kin jinik tirsana teveqê berdide. Destê wê ji kutê filite.

"A divên em qurbana bûka xu, ne bûka me, ji me aqilîtir vû."

Jor da xu davêne serê, ê de çend hev in. Heta ku radivin jinik binê wan da mirîye.


## Meseloka kûsî

4 **Kûsî diqefêlin nizanin çi ye. Tînin tên ba jîrkê xu. Jîrkê wan hevye jîrkê pirsa. A tînin balê divên:**
**"Vîya çi ye?"**
**A divê:**
**"Çevê we rijîyano, hûn zanivin ez ê bimrim hûn ê bêaqil herin ji dinyahê. Evya kew e, deştê da mahe, pûrta xu weşandîye û bivin helkin[6] bikine ber denîyê nokê reş ku çi xweş e."**



(5) Çîye: Çûye.
(6) Helkirin: Hûrkirin.






# Mêyof û mahi

"Hûn gelek baş hatine. Mahi, ew e mêyof e şîrê xaw wexwarîye. Ez aweke hinde temîz im, hinde cindî me ku her kesek, heywan û cûcik û dar û gîya. . . awa min wedixwun lê ew mêyof dê bên min bênivêj biken, min hetikînin. Êkê lê de, bikuje bila bikewte erdi, bimirit em jî ji mêyofekê xilas bin."

**Hikmet Yildiz**

Tehsîn Baravî

## Li ser evîndarîyê




Darga dar benîştî
Teyrik û tar lê nenihiştî
Xwezga wê rojê,
Ew roja ez û delalê xwe'l binê wê rûniştî.

Çîya bilin in, nizm nabin
Gelî kûr in, bilind nabin
Ez çavê xwe digêrînim,
Ez delalê dilê xwe nabînim.

Lo Hîzilo[14] lemelem e
Kelekvano, li bextê te me
Tu lawê min derbas ke,
Ez kefîlê heqê te me.

Lo pismamo, dohmam gorî
Simbêl sor û ji lêvê borî
Ez ê destê pismamê xwe bigrim,
Bavêm xeta Sûrî.

Ser medresê, bin medresê
Gulî çêkir pê miqesê
Gulî reş û gulî têlî,
Xewka min tê, tu nahêlî.

(14) Çemê Hîzil: Çemê Hezilê. Çemekî di navbeyna Zaxo û Silopyayê da.


Gundê Giteyê

Berhevkar: Xalid Celalî
Zarbêj: Pakistan Uslu
Temen: 40
Perwerde: Nexwende
Herêm: Gite/Silopya/Şernex
Dîroka berhevkirinê: Tebax/2019







**Arêkerdox:**
**Surya Human**

Vatoxi:
Horê Kiliç: 67, nêwendî, Şeynan/Hêni/Dîyarbekir
Minewş Çelik: 60, nêwendî, Mişrif/Licê/Dîyarbekir
Rîndê Tekin: 58, nêwendî, Şêxbûba/Pasûr/Dîyarbekir
Fikrîye Human: 46, nêwendî, Qurmik/Licê/Dîyarbekir

# Mîyanê şarî de nameyê nêweşîyan û weşkerdişê înan

**Quxikê Dîkan: Kixeyêko derg o. Sey şubi bîyêne vila û merdim wexta kixêni bîyêne lalî. Weşkerdişê na nêweşî, silo kerdenê qule û nêweşî cêr û cor a hîrê hewî berdêne ardêne û kixê înan vindertêni.**

Nê termî mîyanê çar minteqayan de amê are dayene. Termî goreyê fekî yê, yanî orîjînalê înan ameyê nuştiş. La îzehetê terman, semedêke bêrê fam kerdene, goreyê rastnuştişê redekte bîyê.

**Alacûqe:** Bizrik a, bena pîle. Rîm û ziqaw kuweno ci. Dermanê aye vaşê pûnî yo. Pûni zî verê çeman de beno zergûn. Şîyêne pûni are kerdayêne û ardayêne, girênayêne û pê alacûqe şitêni û nêweşî bîyêne weş. Bibo weşe zî, herundê ya belî yo. Heke ena nêweşî tedawî nêbo, açarêna êşêko bêderman.